



Vî welatî Nas Bike!

Kamerûn




Rûber: 475 , 440 km²
Hijmara xelkî: 12 milyon kes
Paytext: Mawindî 555 800 kes
**Ayîn: Pîtir ji 51% aynên sirûşfî. 33% xiristi-
yan û 16% musulman**
**Ziman: Îngilîzî û Firensî zimanên fermî ne lê
gelek zimanên dî jî lê hene.**
Pare: Firan
**Sîstema deshelatdariyê: Komareka
federal**
**Mezintirîn bajêr: Diwala 1502000 kes
nikunçsamba 62000 kes.**



Kamerûn dikeve Efrîka navîn û navê wê ji berên bihagiran hatlye û wateya wê welatê berên bihagirane.
Ji sala 1884 heta sala 1916 ê kete bin destî Elmanya.
Li sala 1916 bû koloniyeka Firensî heta sala 1961ê ku serxwe-
bûna xwe wergirt.





Kamerûn li ser sinorên van welatan e: Nîgîriya, Efrîka navîn, Kongu, Gabon, Gîniya û deravê Gîniya. Erdnîgariya axa Kamerûn erdnîgariyeka rengîne bigire ji kenarên avê, deşt, banî, daristan û çiya. Bilindtirîn kopê çiya kopê Kamerûn e ku bilindahiya wî digehe 4070 mêtiran.

Piraniya axa Kamerûn bi giya û darên sirûştî ya dapoşî ye û keşubayekê gelek rengîn heye. Li hindek deverên wê gelek baran dibarin hindekên dî jî dihîşkin. Lê baştirîn keşuba li bilindahiyên rojava û navenda wê ne.

Xelkê Kamerûn ji pitir ji 200 hozên zincî pêk dihê ku pitir ji 80% ji xelkê wê ne. Yên mayî berber û hamî û hindek erebin ku li bakûrê Kamerûn dijîn û musulman in.

Pitir ji 70% ji xelkê Kamerûn cotyarin û di karê çandinê de kar dikin.

Ji berhemên çandinê: Moz, kasava, birinc, pembû, qehwe û kekew.

Ajalên dihêne bi xudan kirin: Çêl, pez, bizin û beraz in.

Ji samanên wê yên sirûştî: Qesdîr, buksêt zêr û hindek madenên dî.

Kamerûn dabeş dibe ser deh parêzgehan û rewşa wê ya siyasî ne gelek baş e û pêdivî ye çaksaziyên demokratî lê bêne kirin. Rewşa wê ya aborî jî ne gelek baş e û piraniya xelkê wê di hejariyê de dijîn.

